Berhemên Zarokan

Sêv û moz û hinar

Nuşan bayiz Omer

Rojekê sêv û moz û hinar pêk ve rwînişt bûn.
Sêvê got: Ez ji hewe herduka ciwantir û xoştirim.
Hinarê got: Nexêr, ez ji hewe herduka ciwantir û xoştirim; çunkî sêv dirrzin û moz dihelyên.
Mozê got: Ev pit pita hewe ya ji xoye, hemî xelk dibêjne min: Tu gelek ya xoşî!
Sêvê got: Da biçîn pirsîyara hindek gîyanewera bikeyin.
Çûne nik hespî, hespî got: Sêv geleka xoşe!
Keribên mozê û hinarê vebûn û gotin: Sêvê, te got da biçîne nik hespî; çunkî ew hevalê te ye û te gelek dixut.
Mozê got: Da biçîne nik meymwînkê.
Çûne nik meymwînkê, meymwînkê got: Moz geleka xoşe!
Paşî çûne nik dîklî, dîklî got: Hinar geleka xoşe!
Çûne nik çêlê, çêl hevala kesê nîne, lew wê got: Hwîn her sê gelek di xoşin, bila hewe hersêka bixum?
.Gotinê bila, bes berikên me nexo, da em bo hemî kesa şîn bibîneve